


Rapora Mehane ya Kuşṭîyêñ li Sûrîyayê

Nîsan 2019



Statîstîkên Giştî




Hejmara Qurbanîyan ji nîvê adara 2011an ve

Navenda Bibelgekirina Binpêkirinan ji
nîvê adara 2011an heta dawîya **Nîsan
2019an**, kuştina **192,036** kesan li
Sûriyayê bibelge kiriye


● **123,924 (64.53%)**
welatîyên sivîl in

● **68,112 (35.47%)**
ne welatîyên sivîl in




Kuştî li gor alîyê kujer

Kesên berpirs di ber hejmara herî mezin a kuştîyan de (yên sivîl û ne sivîl) ji nîvê adara 2011an heta **Nîsan 2019an**



Kesên berpirs di ber Kuştîyên Sivîl de ji nîvê adara 2011an heta **Nîsan 2018an**



Nîsan 2019 Statîstîkêن




1. hejmara kuştîyên ji ber şeran

Navenda Bibelgekirina Binpêkirina di **Nîsan 2019an de**, **260** kuştî li seranseri Sûriyayê bibelge kir. **240** ji nav wan bi navêن xwe hatin bibelgekirin û **20**yên din weke kesêن nenas hatin bibelgekirin.

2. Kuştî li Gor parêzgehê


Hejmara herî mezin a kuşîyan li parêzgeha Êdlêb bû, Navenda Bibelgekirina Binpêkirina **83** nav bibelgekir, piştre Hema Zorê **58** kes, paşê Deir Ezzor **54** kes û **65**ên din ji parêzgehêن Sûriyayî yên din in.



● Êdlêb ● Hema ● Deir Ezzor ● Others

3. Kuştî li Gor Beşan (Sivîl û Ne sivîl)


Hejmara kuştîyên sivîl **224** kes in û yên ne sivîl **36** kes in



● Sivîl ● Ne sivîl

4. Kuştî li Gor Sedema Mirinê


Hejmara kesên ku ji ber guleyan hatin kuştin **42** kes in, bombebaran û bermîlên teqîner bûn sedema kuştina **28** kesan. Hejmara kesên ku ji ber hawin û tankan hatin kuştin **83** kes in û **16** kes hatin işkencekirin û ji ber wê di girtîgehêن Hikûmeta Sûriyayî de hatin kuştin, ji alîyekî din ve **72** kes ji ber tirimbêlên bombekirî û mayinan hatin kuştin û **4** ji hêla alîyênen nenas ve hatin revandin. **0** kes ji ber dorpêçê hatine kuştin û **0** ji ber kilorê. **15** kes bi rêya sedemên din hatin kuştin.



5. Kuştî li Gor Zayendî

Hejmara kuştîyên nêr ku temenên wan bêhtirî hêjde salan e **177** e û yên zarok **29** e.

Hejmara kuştîyên jin **30** bû û yên zarok **24** bû.



6. Kuştiyên ser destê Dewleta İslamî

Navenda Bibelgekirina Binpêkirina li Sûriyayê kuştina **43** kesan li ser destê Rêxistina Dewleta İslamî li Îraq û Şamê –DAIS, bibelgekir. **32** kuştî welatîyên sivîl bûn û **11** ne sivîl bûn.



Hejmarêni di vê raporê de xwe dispêrin Navenda Bibelgekirina Binpêkirinan. Ew ne hejmarêni dawî ne û rastî guhertin û rastkirinê ji hêla birêveberên Navenda Bibelgekirina Binpêkirina û Tîma Bibelgekirina Mîdanî.

Her raporek hejmarekê pêşkêş dike û hejmara rast di rapora dawî de ye. Em spasdarên endamên tîma bibelgekirinê ya meydanî ne ku rojane dikevin metîrsiyê de da ku binpêkirinên mafêni mirovan li Sûriyayê bibelge dikin û belvaokên navendê bêyî xebata wan nedihatîn weşandin.



مرکز توثيق الانتهاكات في سوريا
Violations Documentation Center in Syria

www.vdc-sy.net

Eger têbînî an pirsên wan hebin, bi rêya vê emailê bi me re têkildar bin:
editor@vdc-sy.net

Bo dîtina raporên me yên berê bi zimanê erebî
[/http://vdc-sy.net/category/reports_ar/monthly_reports_ar](http://vdc-sy.net/category/reports_ar/monthly_reports_ar)

Bo dîtina raporên me yên berê bi zimanê îngilîzî
[/http://vdc-sy.net/category/reports/monthly_reports](http://vdc-sy.net/category/reports/monthly_reports)